

## Bidestxistina kar ji bo kesên pêvajoya penaberîya wan li NRWê dom dîke (bi Îqametname, belgeyên îsbata hatinê û BÜMA)

Kesên li NRWê dijîn û **destûra wan ya Îqametê (Aufenthaltsgestattung)** û **belgeyeke şeweya hatina wan îsbat dîke** an jî **BÜMA** wan hebe, divê herdem berîya destpêka kar bo **destûra kar** serî li Daîreya Biyaniyan bidin. Dana destûrê bi sê mercan ve girêdayî ye:

- **Bi Moletêa îqameta we ya li Almanyayê**
- **Bi welatê hûn jê tîn**
- **Cîhê hûn li NRWê lê îqamet dikin**

### BALDARÎ QEDEXEYA KAR !

Ji bo kesên ku dewleta jê hatine weke **dewleta ewle** hatiye binavkirin û piştî **31.08.2016an** serî li mafê penaberiyê dane, kar bi qanûnê hatiye qedexekirin. A diyarker dema qeyda pêşî ye. Ango dema li ser BÜMA-yê girîng e. **Bo kesên ku BÜMA-ya wan berîya 31.08.2016an hatiye amadekirin, qedexe bêhukm e.**

**AGAHÎ:** Li gora qanûnê qedexeya kar, bo kesên piştî 31.08.2016an daxwaza penaberiyê kirine, pêvajoya wan ya penaberiyê hêj bidawî nebûye û kesên serlêdana wan red bûye û lê Duldunga wan heye. **Kesên ku bêtir pêvajoya mafê penaberiyê, ji sedemeke din Duldung bi wan re heye, nakevin ber vê qedexeyê.**

**RÊNÎŞANDANEK:** Bi saya **kopîkirina BÜMA-yê** dikare herdem qeyda pêşî bê îsbatkirin.

\* Hûn dikarin lîsteya hêj nû ya **"dewletên ewle"** di pêvek II ya §29 ya Qanûna penaberiyê de bibînin. Niha ev dewlet in: Albanya, Bosna- Herzek, Gana, Kosovo, Makedonya, Montenegro, Senegal û Sirbîstan.

**Eger qedexeya kar tune be, bidestxistina kar weha tê birêk û pêkkirin.**

### Îqameta ji 1 mehê heta 3 mehan:

Di sê mehê pêşî de dem dema li bendêmanê ye. Kar qedexe ye.

### Îqameta heta 6 mehan:

Dema li bendêbûnê dikare heta 6 mehan dom bike. Ev bi vê yekê ve girêdayî ye, bê kesek li wargeheke eyaletê çewa hatiye bicîhkirin.

### Piştî libendêbûnê heta îqameta 15 mehî:

Niha mercên bo bidestxistina kar hene. Daîreya Biyaniyan bo biryardana serlêdaneke bo destûra kar, rîza **Ajansa Federal ya Kar (Bundesagentur für Arbeit)** digre. **Ew (Ajansa Kar) herdem dinirxîne:**

- Ka gelo bê dê mercên kar ji bo kesê/kesa bi Duldungê û misamehe lê tê kirin jî weke mercên karkerên alman be, an na.

Eger kesê misamehe lê tê kirin **li devereke ku Ajansên Kar ên Dortmund, Duisburg, Essen, Gelsenkirchen, Oberhausen an jî Recklinghausenê** îqamet dîke, ev yek jî tê nixandî:

- Bê ev kar bo Almanan, karkerên ji welatê Yekitiya Ewropayê, an jî kesek bi îqameteke ku derceya wê bilindtir re, ye.(ontrola pêşaniyê).

**ISTISNA:** Ajansa Kar ji bo hin pêşyan(meslek) kontrola pêşaniyê bikar nayîne. Di sala 2016an de li gel hin pêşyan dinê ji bo pêşyan li jêr weha ye: Karên hesin û metal, mecha-tronîk, elektro-mekanîk, lêkirina xêniyan, lûlekarî, xizmeta kal û pîran û nivîsandina programan. Wekî din jî rewşên awarte hene ku bi tevayî ev yek nayê bikar anînîn.\*\*

### Îqameta ji 16 ta 48 mehan:

**Ji meha 16an heta meha 48an li her devera NRWê** tê nixandî, bê gelo bicîhkirina weke şert û mercê karkerekî/karkereke alman mimkin e, an na.

### Îqameta ji 49 mehan pê ve:

**Li Almanyayê ji meha 49an pê ve** rîza Ajansa Kar êdî ne pêwîst e. Eger bi taybet qedexeya kar tune be, kesê xwediya/xwediya Duldungê dikare di her kar û şuxlekî de bixebite. **Lê divê ev yek jî aliyê Daîreya Biyaniyan li ser belgeyê bête nivîsandin.**

### AGAHÎ:

- Biryara teqez, bê gelo destûra kar tê dayin, an na ya Daîreya Biyaniya ye.
- Destûra kar, piştî bidawîbûna dema libendêbûnê jî ji aliyê Daîreya Biyaniya xwe bi xwe li ser kaxeza nasnameyê nayê nivîsandin. J i bo vê yekê divê mirov bi xwe bi awayekî çalak hewl bide.

Kurmandschi

(Zugang zu Beschäftigung für  
Personen im laufenden  
Asylverfahren in NRW)



## Têkilî

### Kar û şuxlên bi serê xwe

Bi belgeya îqamê, BüMA û belgeya îsbata hatinê, karên bi serê xwe(kasib) **ne mimkin in.**

### Karê demkî

Karê demkî **bi tevahî piştî sê mehan** mimkin e. Di prensîbê de, li deverên **Ajansên Kar ên Bochum, Dortmund, Essen Duisburg, Gelsenkirchen, Oberhausen û Recklinghausenê**, destûra karê demkî, piştî **15 mehan** tê dayin. Di hin rewşên istisna de li van deveran jî piştî sê mehan karê demkî mimkin e.

### Tedbîrên Întegrasyonê yên Penaberiye(FIM)

Li gorî “qanûna penaberiye \*\*\*\*\*” ku di sala 2016an de misoger bûye, dibe ku li ser kesên li mafê penaberiye digerin û li gorî qanûna penaberiye alîkariye werdigrin, bê ferzkirin ku beşdarî(Tedbîrên Întegrasyonê bo penaberan) FIM-ê bibin. **Ev ne mijûliyeke bi rêk û pêk e**, bêtir weka karên di çarçoveya FIM-ê ên saeta wan bi 1 Euroyî ne. Lê li vir bo saetê kêmtir ango 0,80 Euro tê dayin.

**\*\*AGAHİYÊN DINÊ:** Hûn dikarin agahiyê derheqê bazara kar û ji bo kesên pêvajoya penaberiya wan dom dike, li vê bibînin. [www.fnrw.de/alpha-owl/hintergrundinfos](http://www.fnrw.de/alpha-owl/hintergrundinfos)

\*\*\* Jiber ku pirayiya guhertinên bi qanûna întegrasyonê zîrê didin pêvajoya întegrasyonê û hin caran jî ji aliyê hiqûqî ve bi problem in, Konseya Penaberan ya NRWê li himberî vê binavkirinê ye û wê weke, “qanûna rêgirîya întegrasyonê binav dike”.

**Lisa Walter**

alpha OWL II  
Flüchtlingsrat NRW e.V.  
Wittener Straße 201  
D- 44803 Bochum

Tel.: +49 (0) 234 - 587315 - 80  
Fax: +49 (0) 234 - 587315 - 75

Telefonsprechzeiten: Mo-Do 10-16 Uhr  
E-Mail: [alphaOWL@fnrw.de](mailto:alphaOWL@fnrw.de)  
[www.fnrw.de/alpha-owl/](http://www.fnrw.de/alpha-owl/)

Das Projekt alpha OWL II wird im Rahmen der ESF Integrationsrichtlinie Bund im Handlungsschwerpunkt „Integration von Asylbewerber/-innen und Flüchtlingen (IvAF)“ durch das Bundesministerium für Arbeit und Soziales und den Europäischen Sozialfonds gefördert.



Zusammen.  
Zukunft.  
Gestalten.

# FlüchtlingsRAT NRW e.V.

## Bidestxistina kar ji bo kesên pêvajoya penaberiya wan li NRWê dom dike

(Çiriya Paşîn 2016)

Herausgeber: Flüchtlingsrat NRW e.V. im  
Rahmen des Projektes alpha OWL II